

Kurdisch

## Bi xweliyê li hêviya min be

- Ji jina min re, ya ku li hêviya min e

Liu Xiaobo

Tishtek di destê te namîne,  
ji der ku Tu bi xweliyê li hêviya min bî.  
Qat bi qat  
ew qurchikan dadigire.  
Tu perdeyan berdidî,  
bila roj xweliyê dilteng neke.

Li ser refikên pirtûkan nivîs di nav xweliyê de winda dibin,  
nexshên di tayîj de xwelî têr mijtine.  
Gava Tu ji min re dinivîsî,  
Tu bi dilxwehî pênivîsê di xweliyê de noq dikî,  
zixurên xweliyê êdî xwe di chavên min re radikin.

Tu rojê hemûyî li wê derê rûdinî  
û naxwazî bigerî,  
da lingên Te xweliyê birîndar nekin.  
Tu bi gelek hedanî bîna xwe dikshînî,  
bi bêdengiya xwe çîrokekê dinivîsî  
di vê dema bînchikînê de.  
Tenê xwelî hêjî dilmya te dimîne.

Xwelî dibe  
rastiya awira te, bîna te, dema te.  
Di dilê te de  
roj bi roj gorekê ava dike,  
bost bi bost,  
destpêdike ji ba lingan  
heta bi singê û heta bi gewriyê.

Tu dizanî, gor  
revgeha te yî herî qenc e.  
Kesek te dilteng nake,  
ku tu li wê derê li hêviya min bî.

Vêca peywendiyê te yî taybet bi xweliyê re heye  
di taristaniyê de di bêdengiya bînchikînê de,  
li hêviya min be, tika ye, li hêviya min be.

Li hêviya min be bi xweliyê  
nepejrîne rojê, kishîna bayê,  
heta xwelî te bash gordike.  
Bihêle tu di xew ve herî di nav xweliyê de,  
heta tu shiyar bibî,

dema ez vegerim,  
tu xweliyê ji lashê xwe, ji dilê xwe dadiweshînî  
û wek nemayekê radibî ser xwe.

(Übersetzung aus dem Chinesischen: Martin Winter Dezember 2010,  
Übersetzung aus dem Deutschen (Martin Winter) ins Kurdische: Dr. Zaradachet Hajo, März  
2012)